Kultur

Mirov

Tirîfe Doskî

Sêks

Sêks çekek bo şkestin û kêmkirina ewî/ê dî. Eve wêneyekî kurte ji têgehiştina kulturê me bo kiryara sêksî. Çemkê sêks her di kevin de bûye cihê gengeşê wata endamên sêksî dide wek delaleteka kiryariyeka baylojî jî dide. Lê di heman dem de, wata regez dide ji aliyê jînderî ve, ango bi terziya wekheviya civakî sêks wata regezê nêr û mê dide, sêks li gor sîstemê hizrî û civakî her deverekê xwe dide niyasîn renge eger basê komelgeheka klasîk bikin wek ya kurdî wata dema basê sêksê dikin, li gor sîstemê hizirî û civakî li her deverekê êdî em nêrîna wî serdemî wê deverê didin naskirin bo regezê mê ku dîtina wê komelgehê çawana bo keçan û jinan û qeyran ew peyva civakî çêkirî (êkspayir) a keçan sinorkirî ta zelam bi hizra xwe berteng be û hizirîn girtî hebin sebaret afiretê dibînit kaynek bo betalkirina xwe û firandina her qehreka heye afiret diçavên zelamê klasîkî de û dikultureka klasîkî de wek kulturên rojhelatî bi giştî, wesa hatiye nasandin ku kaynek bo xweşiya yê dî hatiye çêkirin û li welatê me li gor sîstemekî madî ji bilî sîstemê hizrî û sofîgerî jî dihê dîtin ku kelûpeleke wî kiriye û hesta mulkiyetiyê bo xwe çêdike. Wata marebirîn yan next dibe amrazek bo şkestina afretê û padaştek bo mana wê li gel zelamî bo heta hetayî û eve diyare li gor sîstemê çînên hizrî afiret dihê helsengandin. Bo nimûne caran zelamê kurd yê berniyas afiretek divê ya qelew û berkevtî û mil pan û bilind be û heta niha jî ev hizra ya buhaye di serê hindekan de bi taybet çîneka wek pale û fîtir û bazirganan wata leşê wê

bazara wê germ dike, em li komelgehêne, hindek tiştên nihênî ku hene wek pîroziyek bo heye wata bi çavê pîroziyan hatine veşartin. Bi xwe jî tiştên asê û siruştîne wata têgehiştina me wek komelgeh hêşta li gel jinan tinê bi rêka cesteyî ye û jinan kurt dikin. Di vî tîgehî de û nimune, em dibînin zorin wek niktên sêksê, wênên sinîle bi dizî vedişêrin ew gencên li saytên sêksê dinêrin, heta eger binêrin li kulturê xebera cudabûnek heye her kesê bi vê yekî dî bişkêne dibêje hey kurê q------ -, dayika te qeh-----xûşka te qeh----. Wata rîswakirina nêran bi rêka jinan û xûşkan dihê kirin. Ango jin hêmayeke bo şkestina namûsa binemalê heta em wek ziman jî dikevine ber kirêtkirina jina bi cureha saxletên kirêt û nemirovayane. Wata leşê mê şermezariyeke heta di nava malê de jî dema zaroka keç diguhorin cudabûna xwe li gel kurê zarok heye. Ewa min divê bibêjim sêks şaş hatiye nîşandan. Wata kiryareka kirêt, bi tirs, şerm û heya, ev nasandine bo hemû baylojiya mirovan nehatiye naskirin. Heta bi rêka mêtodê me yê xwendinê dema babetên bi leşî ve dihêne veşartin, bi taybet li xwendingehên têkel û êdî genc rojane xwe bi tinê wek leş dinase û bi tirs li xwe dinêrin dema ku mamostayî ew dema hebûye bibêje tu wesa mezin dibî û ev guhorîne asanin û netirsin. Êdî kes xwe wek leş nenasî heta dereng û heta çend arîşe bo hindekan jê dirust bûyin, ew têriwanîne şaşe mirov bi hemû ve ciwane, bi hizra xwe, bi leşê xwe.